Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :835 03-Sibat- 2021 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Encamnameya Konferansa Jinên Ciwan yên Têkoşer hat aşkerakirin

Encamnameya 3'yemîn Konferansa Jinên Ciwan yên Têkoşer hat aşkerakirin. Di encamnameyê de biryarên wekê ji bo Azadiya Rêberê PKK'ê xurtkirina çalakiyan û ji bo jinên ciwan amadekariya dewreyên perwerdê hatin girtin.

Di 29'ê çileya 2021'an de li Silêmaniyê 3'yemîn Konferansa Jinên Ciwan ên Têkoşer bi dirûşmeya "Birêxistinbûna jinên ciwan, dema azadî bidestxistinê ye" bi tevlîbûna 100 delegeyan hatibû lidarxistin. Encamnameya konferansê hate weşandin.

**Encamnameya konferansê wiha ye:**

" Li Silêmaniyê 3'yemîn Konferansa Jinên Ciwanên Têkoşer bi dirûşmeya, 'Birêxistinbûna jinên ciwan, dema azadî bidestxistinê ye' bi tevlîbûna 100 delegeyan dest pê kir. Jinên ciwan ên Şingal, Mexmûr, jinên ciwanên Tevgera Goran, nûnera Rêxistina Yesna û Rojhilatê Kurdistanê jî tevlî bûn. Her wiha peyama jinên ciwan ên bakurê Kurdistan û Ewrupayê jî bi dîmen hate weşandin.

Destpêkê konferans bi deqeyek rêzgirtin li ser ruhê pak ê hemû şehîdan dest pê kir. Di kesayeta şehîd Viyan Soran de, hemû şehîdên jinên pêşeng, şoreşger û jinên Başûr hatin bibîranîn.

Piştî wê di axaftina destpêkê de behsa giringiya konferansek di nava şert û mercên niha de hate kirin. Armanca sereke ya konferansê, şopandina kar û xebata dû salên borî ya rêxistina me bû û ji bo bihêzkirina kar û xebata jinên ciwan bû. Di konferansê de panoramaya kar û çalakiyên dû salan birêya sînevîzyonekê hate nîşandan. Her wiha rapora kar û xebata dû salên borî hat xwendin.

Bi giştî di konferansê behsa rewşa siyasî, civakî ya Herêma Kurdistan û Iraqê, bi taybet jî siyaseta dijdemokratîk û gendeliyê hat kirin. Dîsa behsa êriş û dagirkeriya dewleta tirkî ya hem di aliyê leşkerî, siyasî, aborî û çandî ya li ser başûrê Kurdistanê hat kirin. Behsa berxwedana xelkê Şengal, wargeha Mexmûr û hemû beşên din yên Kurdistanê a dijî dagirkeran hate kirin.

Hate gotin ku jinên ciwan hemberî dagirkeriya çandî, qurbanê yekemin û dixwazin ciwanan bê naverok û bingeh bihêlin. Her wiha behsa giringiya nerazîbûna ciwanan a dijî hemû gendelî, siyaseta şerxwaz ya PDK'ê û alîkaridayîna dagirkeran hat kirin. Ji bo rêgiritina li hemû pirsgirêk, aloziya civakî, siyasî û aboriyê, rêxistina me di nava dû salên borî de, gelek pêngavên



hişyarî û çalakiyên cûda pêkaniye. Gelek çalakiyên fikrî, pîşeyî û dîsan çalakiyên bi armanca hişyarkirin û xweparastina jinan li hemberî hemû cûrê tundûtujiyê hat lidarxistin.

Rêber Apo yekem car tezên fikrî pêşkêşî hemû jinan, bi taybet jî jinên ciwan kiriye. Ji bo xwedî derketina li fikirê rast yê azadiyê, navenda çalakiyên hemû jinên ciwan azadiya Rêber Apo bû. Di vê çarçoveyê de jî gelek çalakî hatin lidarxistin."

**Jinên ciwan di konferansê de biryarên wiha girtin:**

"*Em ê ji bo azadiya Rêber Apo çalakiyên cur bi cur lidarbixin.

* Ji bo hişyariya fikir ya di warê pêşengtiya jinan de, vekirina dewreyên perwerdeyê.

* Li dijî dagirkeriya leşkerî, siyasî, aborî û çandî ya li ser civaka me, em ê bi çalakiyan têkoşîna xwe bilind bikin.

* Dijî tundûtujiya ser jinan çalakî wê werin pêşxistin.

* Avakirina aboriyek koperatîf, bi taybet li Silêmanî û Raperînê. Avakirina derfeta kar ya ji bo jinên ciwan karek bingehîn yê me ye.

* Lidarxistina çalakiyên hunerî û jîngeyê.

* Ji bo pêşxistina ciwanan, dewamkirina çalakiyên pêşbirkên wêjeyî û çandî ya şehîd Şinyar."

Di konferansê 7 jinên ciwan ji bo Desteya Rêveber ya Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer hat hilbijartin.

# Dayîka şehîd Viyan Caf: Keça min rêya serbilindiyê hilbijart

Dayîka Şehîd Viyan Caf di 15'emîn salvegera şehadeta keça xwe de got; "Keça min rêyek serbilindiyê hilbijart û ez jî pê serbilindim. Ji ber ku ew di li pey serkeftina gel û Kurdayetiyê de çû."

Leyla Walî Hûseyîn bi nasnav Viyan Caf di sala 1981'an de li bajarê Silêmaniyê hatiye dinê. Viyan ji eşîreta Caf e. Di sala 1997'an de beşdarî nava refên Partiya Karkerên Kurditanê (PKK) dibe. Viyan Soran şeva 1 li ser 2'yê Sibat 2006'an li herêma Heftenînê li dijî komploya navdewletî ya li hember Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û hewildanên tasfiyekirina PKK'ê ya di hundir de çalakiyek fedayane lidarxist.

'Ji bo min weke hevlek bû'

Dayîka şehîd Viyan, Glawêj Elî di 15'emîn salvegera şehadeta keça xwe de ji Rojnews re axivî. Dayîka şehîd Viyan destpêkê balkêşa ser kesayeta keça xwe û got; "Hertim giringiyê dida karên xwe û li rexa xwendina xwe kar jî dikir. Di mal û nava hevalên xwe de de keçek zi-



man xweş bû. Ji bo min weke hevalek nêzîk bû."

Gelawêj di dewama axaftina xwe de derbarê rêbaza şehîd Viyan de axivî û wiha pêde çû; "Ji ber ku rêya serbilindiyê hilbijart, ez jî pê serbilindim. Tevî ji ber şehadeta wê ez dilgiranim, lê serê min pê bilinde. Dema ku li çiya di nava gerîlayan de bû, çend caran ez çûm serdana wê. Ji min re digot min dest bi xebatê kiriye. Me nekarî em rê li ber bigrin, ji ber ku biryara wê bi xwe bû. Ew li pey serkeftina gelê xwe û Kurdayetiyê de çû. Hêvî dikim wê dagirker bişkên û gelê Kurd serbikeve. Ji ber ku dagirker rojane me bombebaran dikin, dahatên me wêran dikin, bax û baxçeyên me dişewitînin."

Dayîka şehîd Viyan Caf, Gelawêj herî dawî jî got; "Hinek aliyên siyasî hene ku di navxweyî de xiyanetê li Kurdan û zarokên me dikin. Çi bikin ji bo xwe dikin, ev jî xiyanetek mezine. Divê hemû Kurd weke bira bihevre ji bo serkeftina gelê Kurd di nava hewldanan de bin."

# Neteweyên Yekbûyî daxwaz ji welatan kir zarokên li Kampa Holê wergirin



Neteweyên Yekbûyî bang li welatan kirin ku 27 hezar zarokên li kampa Holê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijîn, dîsa vegerînin welatên wan.

Nûnerê Sekreterê Giştî yê Nivîsgeha Têkoşîna li dijî Terorê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) Vladimir Voronkov bang li dewletan kir ku zarokên welatiyên xwe ku li kampa Holê ne, vegerînin. Voronkov diyar kirin ku ev zarok piraniya xwe zarokên DAÎŞ'ê ne, 27 hezar zarok terkî qedera wan kirine û hişyarî dan ku di nava kampê de metirsî heye ku werin radîkalkirin.

Di kampa Holê ya ku ji mezintirîn kampên koçber û penaberan ên li Sûriyê ye, li gorî rêjeya NY'ê 62 hezar kes lê dijîn. Ji sedan 80'ê yê xwe ji jin û zarokên ku herî dawî sala 2019'an ji herêmên ku ji destê çeteyên DAÎŞ'ê hatîn azadkirin reviyane, pêk tê.

Voronkov destnîşan kir ku zarok ji 60 dewletan di nava kampê de hene û teqez kir ku berpirsyariya wan ji dewletên wan tê xwestin, ne ku ji Rêveberiyê Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê xwestin.

## Li dijî gefên dewleta tirkî banga berxwedanê li êzidiyan hate kirin



***Desteya Oldar û Serokeşîrên Şengalê*** ji bo ku li dijî êrişên deweta tirkî rabin, bang li civaka Êzidî kir da ku nehêlin axa wan ya pîroz bê dagirkirin û li hember her êrişekê ciwanên Êzidî dest biavêjin çekan û berevaniyê ji axa Şengalê re bikin. *R-5*

## Zelal Ceger: Destdirêjiya li ser jinan kîna hêzên desthilatdar nîşan dide



Hevseroka TEV-DEM'ê Zelal Ceger têkildarî qetilkirina Hevseroka Meclîsa Bajaroka Til Şayirê ya navçeya Deşîşayê ya Kantona Hesekê Seda Feysel El-Herms û Cîgira wê Hind Letîf El-Xidêr a ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve wiha got:"Destdirêjiya li ser jinan û şêwaza qetilkirinê, kîna hêzên desthilatdar a li dijî jinê nîşan dide. "*R-3*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 835 03-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Hêzên Ewlekariya Hundirîn: Me dest bi lêpirsîna bûyera ku duh li Keramê çêbûye, kir

Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Reqayê têkildarî bûyera hedefgirtina karwanê hevserokê Meclisa Sivîl a Dêrazorê ku li bajarokê Keramê yê rojhilatê Reqayê rû da, danxuyakirin ku wan dest bi lêpirsînê kiriye. *R-2*

# "Sîxuriyê nekin"

Hevserokê KCK'ê Cemîl Bayik diyar kir ku siyaseta dewleta tirkî ya dagîrker û PDK'ê ji bo gelê Kurd xetereke mezin çêkir û got "Divê PDK soz bide ku sîxûriya Tirkiyê û xizmeta siyaseta qirkirinê neke." *R-4*







## KCDP: Di sala 2020'an de 300 jin hatin kuştin

STENBOL - Platforma Em ê Kuştina Jinan Rawestînin, rapora xwe ya sala 2020'an aşkera kir. Li gorî raporê 300 jin hatine kuştin û mirina 171 jinan jî bi guman e. *R-2*



## Bi vîna jina berxedêr emê tecrîdê bişkînin

Ji sala 1999an heta roja me ya îro Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan her ku diçe girantir dibe. Dewleta tirkî ya dagîrker destûra melbatê û parêzerên wî jî nade ku biçin gel. Ji bo xwedîderketina li Rêber Apo û şkandina tecrîdê, jinên bakur û rojhilatê Sûrî helwesta xwe diyar kirin. *R-3*



## "Hunera me li hember dagîrkeran şoreşa herî mezin e"

Zarokên ku bi wêneyên xwe tevlî pêşengeha ku ji aliye navenda Çand û Hunerê ve hat li darxistin bûne, wiha dibêjin: "Xeyalên xwe bi riya wênexêzkirinê em derdixînin holê. Hunera me li hember dagirkeran şoreşa herî mezin e." *R-7*

## Nexweşxaneya Şedadê di demeke nêz de wê dest bi xizmetê bike





***Werşeyên*** kar yên Nexweşxaneya Gel a Şedadê zêdetirî salekê ye nexweşxaneyê sererast dikin û nexweşxane dê di demeke nêz de bikeve xizmetê. *R-6*

# Hêzên Ewlekariya Hundirîn: Me dest bi lêpirsîna bûyera ku li Keramê çêbûye, kir

Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Reqayê têkildarî bûyera hedefgirtina karwanê hevserokê Meclisa Sivîl a Dêrazorê ku li bajarokê Keramê yê rojhilatê Reqayê rû da, danxuyakirin ku wan dest bi lêpirsînê kiriye.

Têkildarî bûyera gulereşandina li karwanê hevserokê Meclisa Sîvîl a Dêrazorê, Fermandariya Giştî ya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Reqayê daxuyaniyeke nivîskî ji raya giştî û çapemeniyê re parve kir. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Li gorî lêpirsîna destpêkê bi endamên li benda kontrolê re, dema ku trafîka leşkerî li gundewarên rojhilatê Reqayê dewriyeya asayî pêk dianî, karwanekî ji 3 erebeyan di benda kontrolê re bi lez derbas bû. Ji ber ku ew karwan bi guman bû, endamên li ser benda kontrolê gule lê reşandin. Di encamê de ajokarê erebeyekê şehîd bû û 3 kesên din birîndar bûn. Piştre diyar bû ku ew erebe yên karwanê hevserokê Meclisa Sivîl a Dêrazorê ne.
Piştî ku endamên li ser benda kontrolê hatin destgîrkirin da ku sedemên bûyerê û rastî bê eşkerekirin, Fermandariya Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Reqayê dest bi lêpirsîneke berfireh kir."

## KCDP: Di sala 2020'an de 300 jin hatin kuştin




STENBOL - Platforma Em ê Kuştina Jinan Rawestînin, rapora xwe ya sala 2020'an aşkera kir. Li gorî raporê 300 jin hatine kuştin û mirina 171 jinan jî bi guman e.

Platforma Em ê Kuştina Jinan Rawestînin (KCDP), rapora xwe ya sala 2020'an aşkera kir. Li gorî rapora ku hat aşkerakirin di sala 2020'an de 300 jin ji hêla mêran ve hatin kuştin û mirina 171 jinan jî bi guman e. Her wiha sedema kuştina 182 jinan jî nayê zanîn. 22 jin ji ber sedemên aboriyê, 96 jin ji ber daxwaza doza hevberdanê û an jî tercihên xwe hatin kuştin.

**Rapor wiha bû;**

"Di sala 2020'an de herî zêde li Stenbolê jin hatin kuştin. 42 jin li Stenbolê, 25 jin li Îzmîrê, 15 jin jî li Enqereyê hatin kuştin. Ji 300 jinan 97 jin ji hêla mêrê ku pê re zewicinê ve hatin kuştin, 54 jin ji hêla mêrê ku pêre dijîn ve hatin kuştin. 38 jin ji hêla mêrê ku nasdikin ve hatin kuştin. 21 jin ji hêla mêrê ku berê pê re zewicibû ve hatin kuştin. 18 jin ji hêla kurê xwe ve, 17 jin ji hêla bavê xwe ve, 16 jin ji hêla xizmên xwe ve, 8 jin ji hêla mêrê ku berê pê re dijî ve, 5 jin ji hêla birayê xwe ve û 3 jin jî ji hêla biyanî ve hatin kuştin. Nayê zanîn ku 23 jin ji hêla kî ve hatine kuştin.
181 jin li malê, 48 jin li kolanê, 15 jin li cihê kar, 14 jin li eraziyê, 11 jin di nava erebê de, 5 jin li otelê, 4 jin li cihê tenha de, jinek di depoya daran de, jinek li kuaforê hatin kuştin. Cihê kuştina 20 jinan jî nayê zanîn. Li gorî raparê ji sedî 60 jin li malê hatine kuştin.
170 jin bi çekê, 83 jin bi amûrê birînê, 26 jin bi xeniqandinê, 10 bi şîdeta fîzîkî, 2 jin bi şewitandinê û jinek bi madyeyên kîmyevî hatin kuştin. Her wiha jinek jî ji cihekî bilind hatiye avêtin.
Her wiha di rapora salane de rapora meha Kanûnê jî hat aşkerakirin. Li gorî raporê di meha Kanûnê de 32 jin ji hêla mêran ve hatine kuştin. Mirina 9 jinan jî bi guman e.

## Li Mexmûrê çalakiya greva birçîbûnê 48 roj in didome

MEXMÛR - Li Mexmûrê çalakiya greva birçîbûnê ku bi pêşengiya Meclîsa Îştar ji bo piştgiriya greva birçîbûnê a girtiyên zîndanan hat destpêkirin, îro bi koma 22'emîn re dewam dike. Çalakî 48 roj in didome.



Girtiyên siyasî yên li zîndanên Tirkiyê û herêmê di 27'ê Mijdarê de, li dijî tecrîda giran ya li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafên girtiyan dest bi greva birçîbûnê ya bê dem û dorveger kirin. Li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) jî bi pêşengiya Meclîsa Îştar ji bo piştgiriya greva birçîbûnê ya girtiyan di 18' kanûnê de li Saziya Malbatên Şehîdan dest bi greva birçîbûnê hat kirin. Çalakiya li Mexmûrê di roja 48'an de dewam dike.
Şêniyên wargehê bi awayekî girseyî çûn serlêdana çalakvanan û li ser navê şêniyên wargehê Helîm Bulut axivî û got: "Em di serî de ji bo we serkeftinê dixwezin. Ev greva hatî destpêkirin di serî de em Rêber Apo û tevahî girtiyên azadiyê pîroz dikin. Îro roja hevgirtinê ye û roja yekîtiya Gelê Kurd û tevahî gelan e. Ji bo wê jî pêwîste her yek ji me bi rol û berpirsiyariya xwe rabe. Em bikarin serokê xwe û xwe azad bikin û bi serokê xwe re rojên azad jiyan bikin. Em dubare ji hemû çalakvanan re serkeftinê dixwezin."
Li ser navê çalakvanan jî Çîdem Sipêrtî jî wiha axivî: "Weke tê zanîn Rêber Apo bi salan e hatiye dîl girtin ji aliyê hêzên desthiladar. Em jî weke ciwanên Wargeha Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) ku Rêbertî dibêje 'Me bi ciwantî dest pê kir em ê bi ciwantî bi ser bikevin' bi ruhê xwe yê ciwantiyê jî tevlî vê çalakiyê bûne. Heta ku em azadiya rêbertiya xwe pêk bînin em ê çalakiyên xwe bidomînin."


## Ji bo bîranîn salvegera têkoşer Vîyan Soran sînevizyonê hat lidarxistin

ŞEHBA - Meclîsa Jina Azad a Şehbayê ji bo bîranîn salvegera têkoşer Vîyan Soran ya ku li dijî komploya navneteweyî ya li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan çalakî li dar xist, sînevîzyonek pêşkêş kir.



Ji bo bîranîna salvegera têkoşer Vîyan Soran ya ku li dijî komploya navneteweyî ya li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan çalakî li dar xist. Meclîsa Jina Azad a Şehbayê senevizyonek li navçeya Ehrezê ya Kantona Şehbayê pêşkêş kir. Bi dehan Endamên Meclîsa Jinên Şehbayê û şêniyên navçeya Ehrezê tevlî temaşekirina sînevizyonê bûn. Her wiha pankarta bi nivîsa "Dema ez şehîd ketim şînê nekin, govendê bigerînin" ji gotina têkoşer Vîyan Soran hatibû daliqandin.
Piştî deqeyeke rêzgirtin ya ji bo cangoriyên azadiyê, nameya ku têkoşer Vîyan Soran nivîsandiye ji aliyê Cîgira Meclîsa Jina Azad a Şehbayê, Silava Hisên ve hat xwendin.
Paşê senevizyonek li ser jiyana têkoşer Viyan Soran hat pêşkêşkirin.
Senevizyon bi dirûşma "Şehîd Namirin" bi dawî bû.

## Ji ber êrişên dagîrkeriya Tirkiyê metirsiya telefbûna genim



Ji ber êrişên artêşa Tirk a dagirker ên bênavber li dijî Eyn Îsa, metirsî hene ku genimê di depoyan de telef bibe. Ji ber ku aliyên pêwendîdar nikarin genim ji depoyan derxin.
Ji ber topbarana artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ya li dijî herêmê, aliyên pêwendîdar ji 18`ê Kanûnê ve nikarin xwe bigihînin herêma depoyan a Mişêrfe ya Eyn Îsayê.
Ji ber topbaranê, depo û xetên kehrebeyê gelek zirar dîtiye.
Depoya Mişêrfe bi 2 kîlometre li bakurê navçeyê ye û bi 500 metreyan li rojhilatê rêya M4 e. Şîrketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê bi armanca peydakirina ard ji 6 firinên navçeya Eyn Îsayê re, tê de 5 hezar û 400 ton genim depo kiribû. Bi barîna baranê re û li gel zirarên ji ber topbarana ji hêla dewleta Tirk a dagirker ve, aliyên pêwendîdar metirsîdar in ku genim telef bibe. Aliyên pêwendîdar di dema niha de, miqdara pêwîst a ard ji aşê El-Qerat ê li navçeya Çelebiyê ya kantona Kobanê re peyda dike. Ev aş mehane derdora 600 ton ard derdixe.
Li gorî aliyên pêwendîdar derdora 2 hezar û 100 ton genim li depoyên Mişêrfê ya Eyn Îsayê maye.
***ANHA***



# "Hunera me li hember dagîrkeran şoreşa herî mezin e"

Komîna Sînemayê ya herêma Efrînê bi hevkariya MSD'ê pêşangeheke wênesazî û peykersaziyê li hola Lîstokan ya kampa Serdemê vekir.

***Sara Şêx Hesen***

Zarokên ku bi wêneyên xwe tevlî pêşengeha ku ji aliye navenda Çand û Hunerê ve hat li darxistin bûne, wiha dibêjin: "Xeyalên xwe bi riya wênexêzkirinê em derdixînin holê. Hunera me li hember dagirkeran şoreşa herî mezin e."

Bi boneya salvegera sêyemîn êrîşên li ser Efrînê, navenda Çand û Hûnerê ya Cemîl Horo pêşengeheke wênesaziyê ya zarokan bi dirûşma "Hunera zarokan şoreşa herî mezin e ji bo azadiya Efrînê û tunekirina dagîrkeran"vekirin. Di pêşengehê de nêzî 50 zarok bi wêne û tabloyên xwe tevlî vê pêşengehê bûne. Bi gîştî nêzî 200 tabloyên ku bi destên zarokan hatiye xêzkirina hatine daliqandin. Pêşengeh li navenda Çand û Hunerê ya Cemîl Horo li taxa Eşrefiyê ya Helebê hate çêkirin. Ev pêşengeh dê rojekê dewam bike. Têkildarî mijarên ku zarok tevlî vê pêşengehê bûne nêrînên xwe bi me re parve kirin.

### "EM XEYALÊN XWE BI RIYA WÊNEXÊZKIRINÊ BI LÊV DIKIN"

Zaroka bi navê Kafa Dasekilî li ser vekirina vê pêşengehê nêrînên xwe anî ziman û ev tiştî got: "Ez gelek ji xêzkirina wêneyan hez dikim. Di serî de em spasiya çand û hunerê dikin ku ev derfet dane me, da ku em wêneyên xwe di hundir vê pêşengehê de pêşkêş bikin. Gelek wêneyên min di vê pêşengehê de hene yek jê min wêneyê Barîn Kobanê xêz kiriye, ji ber ez gelek bi şehadeta wê bandor bûm. Her wiha wêneyek li ser kalekî temen mezin min xêz kiriye, ji ber kesên temen mezin dîrokên me ne. Di heman demê de ez di wêneyên xwe de kar û xebatê jinan didim pêş. Ez hemû tabloyên xwe bi kevirê komirê xêz dikim, ji ber zêdetir wateya wê derdixe pêş. Em xeyalên xwe bi riya wênexêzkirinê derdixin holê."

### "BI RIYA WÊNEYAN EZ BÊRIKIRINA XWE YA EFRÎNÊ RE DERDIXIM HOLÊ"

Zaroka bi navê Fatme Oso li ser Kela Semaan ya Efrînê wêneyê xwe xêz kiriye û beşdarî pêşengehê kiriye, li ser beşdarbûna xwe ji vê pêşengehê re wiha dibêjê: "Piştî ku dewleta tirk Efrîn dagir kir em hatin Helebê û em li vir bi cih bûn. Li Helebê min dîsa xebatê xwe yê xêzkirina wêneyan domand û nehişt ku koçberî bandorê li ser min bike. Bi riya wêneyan ez hezkirin û bêrikirina xwe ji Efrînê re derdixim holê. Efrîn di bîra me de ye em ji bîr nakin, her kêliyên wê di bîra me de maye. Min Kela Semaan ya Efrînê xêz kiriye, gelek kesên hatine vê pêşengehê wêneyê min ecibandin. Ji ber ev kela dîrokî cihekî wê yê taybet di dilê her mirovê ji Efrînê heye."



### "ZAROK PÊŞEROJA CIVAKÊ NE"

Mamosteya wênesaziyê Biharîn Sîno bal kişand li ser armanca wan ji vekirina vê pêşengehê û wiha gotinên xwe anî ziman "Huner şoreşa herî mezin e li hember dagîrkeran, dema êrîş li ser Efrînê pêk hat ne tenê dixwestin ku erdê me dagir bikin, êrîşa wan di heman demê de li ser çand, hûner, dîroka me bû. Hemû şagirtên wêneyan xêz dikin bi tabloyên xwe hatin tevlî vê pêşengehê bûn, ev şagirt jî li navenda çand û Hunerê ya Cemîl Horo bi awayekî akademîk hatine perwerdekirin. Armanca me ya vê pêşengehê ew e ku zarok asta xwe ya fikirî nas bikin, her wiha çand û dîroka xwe baş binasin. Serkeftin ji hemû şagirtên me re."

## Yekem kovara wêneromanî "GOG" ya zarokan ya kurdî derket

Yekem kovara wêneromanî ya zarokan a kurdî GOG derket. Kovar bi zaravayê kurmancî û kirmanckî bi awayekî dîjîtal dest bi weşana xwe kiriye û ji bo zarokên temenê wan di navbera 7-14 salan de ye.

Yekem kovara wêneromanî ya zarokan a kurdî GOG, bi awayekî dîjîtal dest bi weşana xwe kir. Kovar bi zaravayê kurmancî û kirmanckî (zazakî) dest bi weşana xwe kir. GOG, navê xwe ji lîstikeke zarokan a berê girtiye û xwedî naverokeke dewlemend e.

Di GOGê de kowboyê navdar Red Kît, çermsorê biçûk Yakarî, Thorgalê ku li nav cîhana vîkîngiyan ji bo malbata xwe biparêze ji bêgavî şer dike û her wiha çîroka Milo heye.

Xêzkar Dogan Guzel bi karakterê xwe yê "Qirix", Ender Ozkahraman bi "Çîrokên Wê Derê", Îmam Cîcî bi zîncîreya "Ev Kî Ye?" di GOG'ê de xêz kirine û Evdal Can jî çîroka Şahmaranê xêz kiriye. Her wiha di nav karakterên xwînşîrîn ên GOG'ê de Porsor jî heye.

Di hejmara ewil a GOG'ê de hunermendê navdar ê îsraîlî Asaf Hanuka jî bi çîrokek xwe piştgiriya kovarê kiriye. Ji xeynî vê di GOG'ê de çîrokên mirovên zanyar û hunermendan, dahurandina karakterên wêneromanî û nûçeyên zanist û hunerê jî hene.

Gerînendeyê Weşana Giştî yê GOG'ê Îmam Cîcî, anî ziman ku bi GOG'ê xwestine ji bo zarokên ku ji perwerdehiya zimanê zikmakî bêpar in alternatîfekê biafirînin û di heman demê de ji bo nivîskar û xêzkarên kurd jî platfromeke serbixwe berpêş bikin.

Îmam, diyar kir ku pêşî bi awayekî dîjîtal dest bi weşanê kirine û piştî demekê dê dest bi weşana matbû jî bikin. Her wiha Cîcî da zanîn ku dê albumên wêneromanî yên hunermendên xwecihî û biyanî jî biweşînin.




GOG, 48 rûpel e û li ser navnîşana www.gog-weneroman.com tê peydakirin.

## Hejmara nû ya rojnameya Newaya Jin derket

Hejmara meha Sibatê ya rojnameya Newaya Jin bi manşeta "Hevkariya bêdawî ya bi dewleta tirkî re wê dawî li PDK'ê bîne" derket.

Rojnameya Jinê Newaya Jin hejmara meha sibatê gihand ber destê xwendevanan. Hejmara vê mehê bi sernavê "Hevkariya bêdawî ya bi dewleta tirkî re wê dawî li PDK'ê bîne' hat weşandin.
Di hejmara 191'ê de hevpeyvîn bi Endama Konseya Hevserokatiyê ya Partiya Yekîtiya Demokratîk Foza Yûsif re hat kirin. Foza pêşdîtinên xwe yên têkildarî şerê li Sûriyeyê parve kir û nîşan da ku têkiliya PDK'ê ya bi dewleta tirkî re çiqasî zerarê dide berjewendiyên neteweyî. Her wiha girîngiya projeya neteweya demokratîk jî destnîşan kir.
Zerya Gul, Mûrîel Gonzales Athenas û Gulistan Îke jî komploya navneteweyî, tecrîda li Îmraliyê û paradîgmaya çareseriyê ya civakî û azadîparêz a jinê nirxandin.
Rojnamevan Bêrîtan Zagros jî bal kişand ser kampên koçberan ên li Duhokê ku dema dawî bi xwekuştina jinên Êzidî ketin rojevê. Bêtîdan diyar kir ku têkiliya şêniyên kampê bi derve ve qedexe ye, mîna dîlgirtiyan e û destnîşan kir ku PDK a ku bi navê koçberan alîkariyê ji hêzên navneteweyî digire, bi rêya birçîhiştinê hewl dide penaberan terbiye bike.
Rojnameyê têkildarî kampanya TJK-E'yê ya bi navê "100 sedemên ji bo darizandina dîktator" cih da peyamên piştgiriyê yên tevgerên jinan ên ji Tirkiyeyê heta Elmanyayê, ji Meksîkayê heta Kolombiya û Arjantînê.
Sara Aktaş ku demeke dirêj li zindanên Tirkiyeyê ma, qala êşkenceya 'lêgerîna bi rengekî tazîkirî' kir ku mehên dawî ev kiryar timî di rojeva Tirkiyeyê de ye.




Di hejmara Sibatê ya rojnameyê de her wiha encamên polîtîkaya qeyûm li Tirkiyeyê, karên Yekîneya Jineolojiyê ya Mexmûrê tên vegotin.

# Nexweşxaneya Şedadê di demeke nêz de wê dest bi xizmetê bike

Werşeyên kar yên Nexweşxaneya Gel a Şedadê zêdetirî salekê ye nexweşxaneyê sererast dikin û nexweşxane dê di demeke nêz de bikeve xizmetê.



Rêveberiya Xweser di destpêka sala derbasbûyî de ji bo pêkanîna xwestekên welatiyan û pêwîstiya şêniyan bi nexweşxaneyekê da ku xizmeta herêmê bike, dest bi sererastkirina nexweşxaneya Şedadê kir.
Nexweşxaneya Şedadê ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hatibû hilweşandin û xirakirin. Rêjeya xirabûnê ji sedî 75 bû.
Li gorî berpirsê projeyê Mihemed Zêdo ji sedî 95 ji xebata sererastkirinê bi dawî bûye û di destpêka Adarê de dê bikeve xizmetê.
Mihemed Zêdo diyar kir ku werşe bi hemû hêza xwe dixebitin da ku sererastkirina nexweşxaneyê di dema hatiye diyarkirin de bi dawî bikin.
Nexweşxane dê xizmeta zêdetirî 700 gundên girêdayî 4 navçeyên gundewarên başûrê Hesekê bike. Mihemed Zêdo tekez kir ku nexweşxane dê xizmeteke mezin bide şêniyên herêmê, ji ber nexweşxaneya tekane li herêmên gundewarên başûrê Hesekê heta bajarokê El-Siwer ê gundewarên bakurê Dêrazorê û heta bajarokê El-Deşîşa yê li ser sînorê Sûriye-Iraqê ye.
Her wiha nexweşxane dê barê şêniyan sivik bike da ku neçin nexweşxaneyên Hesekê û Qamişloyê.
Mihemed Zêdo da zanîn ku dê alavên pêşketî û kadroyên tenduristiyê di nexweşxaneyê de hebin û nexweşxane dê yek ji baştirîn nexweşxaneyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê be.

# “Çima cîhan li me bûye yek”




**Leylan RESO/Qamişlo**

Dewleta tirkî ya dagîrker her dem gef û êrişên xwe li ser xaka Sûriyê, bi taybetî li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk tîne. Gelê herêmê li hember van gefan bêdeng namînin, ji heft salî heta heftê salî dadikevin qadan û van êrişan şermezar dikin.

**“DIVÊ KU GELÊ ME HEVGIRTÎ BIN”**

Welatiyê bi navê Mehmûd Îbrahîm 61 salî, yê ji taxa xerbî li ser gefan wiha diyar kir: “Li hember van êrişan divê gelê me li ber xwe bide û bi têkoşîna xwe armanca dewleta tirkî ya dagîrker têk bibe. Lê mixabin dewletên navneteweyî li hember van gefan bêdeng mane. Ji bo em axa xwe ji dagîrkeran rizgar bikin, ya herî pêwîst yekîtiya neteweyî ye. Divê gelê herêmê li pêşiya dagîrkeran destek bin. Çimkî bi hevgirtina gelê herêmê û berxwedana şervanan emê xaka xwe rizgar bikin û gefan têk bibin”

**LI HEMBER GEFAN YEKÎTIYA XWE AVA BIKIN**

Jina bi navê Lema Silêman jî wiha axivî: “Em li ser xaka xwe ne çima dewleta tirkî ya dagîrker dev ji me bernade. Her dem dixwaze xaka me dagîr bike û erdnîgariya xwe berfireh bike û îmbiratoriya osmanî ji nû ve vejîne. Her kes li gorî berjewendiyên xwe tev digere. Ma wê heta kengî gelê Kurd rastî êrişan bên. Gef li ser gelê herêmê tên xwarin, bi erêkirina dewletên nevneteweyî ye. Ji bo wê divê gelê me li hember gefan yekîtiya xwe ava bike.”



# 64 roj in çalakiya xwedîderketina li Asayîşa Şingalê didome



Çalakiya xelkê Şingalê ya bi armanca piştgirîdana Asayîşa Êzidxanê hatî destpêkirin 64 roj in berdewam dike. Xelkê Şengalê bi serdanên xwe xwedî li çalakiyê derdikevin.
Li dijî peymana Bexda û Hewlêrê ya li ser Şingalê û her wiha ji bo piştgirîdayîna Asayişa Êzidxanê, xelkê Şingalê bi dirûşma “Em hemû asayîş in” li pêşiya Navenda Asayişa Şingalê kon vedan. Çalakî di roja xwe ya 64’yan de berdewam dike.
Xelkê Şingalê kom bi kom serdana konê berxwedanê dikin û piştgiriya xwe ya ji bo çalakiyê tînin ziman.

# Xwedanên pez li Girê Spî: Miqdara nixalê ya ji bo pez hatiye veqetandin kêm e

Gerînendetiya Çandiniyê ya Kantona Girê Spî bi nirxekî baş dest bi belavkirina para yekemîn a madeya kapekê (nixalê) li kesên ku sewalan xwedî dikin, kir. Sewalkaran got miqdara ku hatiye veqetandin têra pez nake, ji ber ku îsal zêde şînkayî li herêmê tune ye.
Komîteya Sewalkariyê ya Gerînendetiya Çandiniyê kapek li kesên pez xwedî dikin, ên li kantona Girê Spî, navçeya Silûk, Eyn Îsa û Cirinê belav kir.
Komîteyê ji bo her seriyekî pez 3 kg, ji bo her çêlekekê û deveyekî 15 kg veqetandiye û her kîloyek bi 300 lîreyên Sûriyê ye.
Kesên ku pez xwedî dikin zehmetiya bihabûna madeyên wekî ceh û kapekê û yên din dikişînin, ji ber ku li sûka reş her kîloyek kapek bi 650 lîreyên Sûriyê ye û kîloya ceh jî digihêje 500 lîreyên Sûriyê.
Têkildarî mijarê Fehed El-Bedir ku ew jî pez xwedî dike, axivî û spasiya Gerînendetiya Çandiniyê kir ku alîkariya wan kiriye, lê gazin ji kêmbûna miqdarê ku hatiye veqetandin kir û wiha domand: “Ji bo her seriyekî pez 3 kg têrê nake û ev yek têra 3 rojan dike, ji lew ra em neçar dimînin ku êm ji sûkê bikirin û bi nirxekî bilind.”
Ezîz El-Silêman jî bang li aliyên peywendîdar kir ku mehane herî kêm 10 kg êm bidin, ji ber ku bazirgan madeyan biha difiroşin.
Li gorî serjimariya ku hîn jî Komîteya Sewalkariyê xebata wê berdewam dike, li ser asta kantonê 600 hezar serî pez heye, 188 çêlek û 277 deve hene.
Têkildarî daxwazên kesên ku pez xwedî dikin, endamê Gerînendetiya Çandiniyê Mihemed Ednan diyar kir ku kapekê ji aşekî tînin, ew jî li kantona Kobanê ye, ji ber ku hemû aşên li kantonê piştî êrişên dewleta Tirk hatine girtin.
Der barê miqdarê deku ji kantona Kobanê digihêje wan, Mihemed Ednan destnîşan kir ku miqdarên ku têne belavkirin ne bi rêk û pêk in, hefteyê nêzîkî 50 ton digihêje wan.



Mihemed Ednan gotinên xwe wiha bi dawî kir: “Gerînende bi hemû derfetên xwe dê piştgiriya xwedanên pez bikin û her ji du mehan carekê 200 lître mazot bide kesên pez xwedî dikin û kesên ku traktorên ku ji bo xwedîkirina pez bi kar tînin.”



## Heşdî Wetenî

**Ahmet AKTAŞ**

Ev hêza, di sala 2015’an de ji aliyê dewleta tirka ve hatiye damezrandin. Weke navend, herêma Başîqa û derdorê wê hatiye pejirandin.
Ev hêz, bi armanca, li dijî Heşdî Şabî ya girêdayî Îranê û serweriya Tirka li vê herêmê misoger bike hatiye avakirin. Bê gûman ji bo ku rengekî olî jî pêveke û li dijî baweriya Şîa, gelê xwedî baweriya Sunî bikişîne aliyê xwe û bide şerkirin, kete nava hewldanek berfireh.
Ji bo vî karî jî, ew parêzgerê/waliyê Mûsilê yê revok Esil Nuceyfî û bi taybetî kurê wî Ebdullah Nuceyfî erkdar kirin. Bi giranî, ji eşîrên Ereban û hinek Kurd jî yên ser bi PDK’ê ve, di despê de li dor 6000 kes bi rêxistin kirin.
Perwerdeya wan jî, yekser ji aliyê efser/fermandarên leşkerên dewleta tirka ve hatin kirin. Bi gotin, didan diyarkirin ku yekemîn armanca wan; xwedê giravî, bi taybetî Mûsilê, bi giştî jî herêmê ji DAIŞ’ê rizgar bikin û armanca duduyan, ji bo gelên sune ji zulma Heşdî Şabiyê şîa bi parêzin!
Lê armancên sereke yên dewleta tirka ne ev bûn. Vana maske bûn ji bo xapandina raya giştî ji aliyê dînî ve. Belê armanca bingehîn; bi giştî şikandina bandora Tevgêra Azadiyê li herêmê û qutkirina têkilên navbêna Bakur-Başûr-ROJAVA û bi taybetî jî li Şingalê û Mexmûrê û hwd.bû. Li gel vêna armancek din a ginihg jî; bi destxistina pertrol û bazirganiya hemû herêmê bû.
Li ser bazirganiya petrolê ya bi DAIŞ’ê re, gelek belgeyên dewletan jî hene. Weke mînak, dema navbêna Tirka û Rûsa li ser xistina firokê û kuştina sefirê wan xebarbûbû, Putin, bi dengekî bilind got, “belge di dest me de hene ku Tirka çiqas petrol bi rêya DAIŞ’ê firotiye” û her wiha hinek dîmen weşandin jî.
Paşê, bi demê re, ew derewên wan derket holê û nuha aşkeretir dibe ku ew karê li Başîqa dide meşindin, bi tevayî li dijî Tevgêra Azadiyê bû û nuha hijmara wan li dor 20 hezarîne û hewldanên xwe berfirehtir kirine.
Ji bo birêvebirina vê plana xwe, ya bi navê Heşdî Wetenî an jî bi navê Parazvanên Nînovayê an Bekçiyên Mûsilê, dewleta dagirker a tirka, bi Eslî û kurê wî Ebdullah tenê nema, birayê wî Usama Nuceyfiyê serokê berê yê meclîsa Iraqê, cîgirê serokdewleta Iraqê Tariq Haşimî û hwd. jî erkdar kir.
Her wiha divê hevparê vê planê, Eniya Turkmenê Iraqê jî neyê jibîrkirin. Dema koma Hulusi Akar derket geryana Bexda û Erbîl û Kerkûkê, hewldan û liv û tevgêrên vê rêxistinê balkêş bû.
Her wiha, piştî bê destkeftî vegeriyan, hema li pey wan, ew teqînên giran li Bexdayê û deverên din jî ne balkêşin gelo? Nûçeyên mîna ku “êrîşên werin ser Dêrikê, Şingalê û hwd”. û li pey vêna gotinên nasyar û tehdîdkar ên R.Erdogan;”ez di şevekê de ji nişka ve dikarim wer im” jî balê nakişînin?
Tehdîdên wan ji lawazî û tengijî bûna wan e, lê divê mirov jî ne bê xem be!



# Zelal Ceger: Destdirêjiya li ser jinan kîna hêzên desthilatdar nîşan dide

**Rojda SEYIDXAN**



QAMIŞLO - Hevseroka TEV-DEM’ê Zelal Ceger têkildarî qetilkirina Hevseroka Meclîsa Bajaroka Til Şayirê ya navçeya Deşîşayê ya Kantona Hesekê Seda Feysel El-Herms û Cîgira wê Hind Letîf El-Xidêr a ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve wiha got:”Destdirêjiya li ser jinan û şêwaza qetilkirinê, kîna hêzên desthilatdar a li dijî jinê nîşan dide. “

Bi Şoreşa Rojavayê Kurdistanê re jinên ji pêkhateyên ereb piştî rizgarkirina herêmên wan ên ji çeteyên DAIŞ’ê cihê xwe di nav xebatan de girtin. Bûn pêşengên civaka xwe û bingeha rêxistinkirina jinên ereb. Desthilatdarên ku dijminatiya jinan dikin, bi kiryarên hovane êrîşî pergala jinê dikin. Di 22’yê Çileya 2021’ê de Hevseroka Meclîsa Bajaroka Til Şayirê ya navçeya Deşîşayê ya Kantona Hesekê Seida Feysel El-Herms û Cîgira wê Hind Letîf El-Xidêr ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hatin qetilkirin. Têkildarî mijarê Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Zelal Ceger nirxandin kir û ji me re parve kir.

**“SÎSTEMÊN DESTHILATDAR NEDIHIŞTIN ÎRADEYA JINAN BIPEJIRE”**

Zelalê bal kişand ser rewşa jinê ya beriya Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Dema ku em dibêjin Şoreşa Rojava ev şoreş, şoreşa jinê ye. Bi vê yekê em wateya cewhera şoreşê didin nîşandan. Heger em çend salan vegerin paş de, em ê bibînin ku jinê di bin serweriya mêr de nikarîbû serê xwe rake. Li hemû Rojhilata Navîn ev rewş dihate dîtin, taybet jî dîsa jin dibûn qurban. Di dema serweriya Rêjîma BAAS’ê de rast e jinên xwendevan û zane hebûn, lê ew îradeya ku bikaribe li hember van sîsteman bisekine nepejirîbû. Piştî Şoreşa Sûriyeyê dest pê kir, gelek çav li ser Sûriyeyê vebûn û her hêzeke desthilatdar xwest ji axa Sûriyeyê parekê bibe. Bi derketina DAIŞ’ê re rewş hîn xerabtir û aloztir bû.”

**“DESTDİRÊJİYA Lİ SER JİNAN KÎNA HÊZÊN DESTHİLATDAR NÎŞAN DIDE”**

Zelalê derbarê kiryarên ku çeteyên DIAŞ’ê li dijî jinan didin meşandin nirxandin kir û wiha pê de çû: “Dema ku çeteyên DIAŞ’ê herêmên me dagir kiribûn, jin bi rewşên qetilkirin, firotin û revandinê re rû bi rû diman. Niha jî ev kiryarên qirêj dixwazin bidomînin. Hem li herêmên dagirkirî, hem jî li herêmên ku hîn şaneyên razayî yên DAIŞ’ê lê çalak in dixwazin dîsa kiryarên xwe yên hovane bikin. Berî çend rojan Hevseroka Meclîsa Bajaroka Til Şayirê ya navçeya Deşîşayê ya Kantona Hesekê Seda Feysel El-Herms û Cîgira wê Hind Letîf El-Xidêr ji aliyê çeteyên DAIŞ’ê ve hatin qetilkirin. Ev kiryarên wisa lawazbûna çeteyên DAIŞ’ê ya li hemberî îradeya jinê dide nîşandan. Xwestek û îradeya jinên ereb di şoreşa jinê de derket pêş, loma li dijî vê yekê em dibînin êrîşên herî hov li ser jinan tên kirin. Li dijî hişmendiya tarîtiyê jinên ereb têkoşiyan û bi pergala netewa demokratîk re bûn pêşengên civaka xwe. Hedefgirtina jinan derbeya li dijî pergala netewa demokratîk e û daxwaza valaderxistina şoreşa jinê ye. Berovajî wê li dijî kujerên jinan hemû jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di nava têkoşînê de ne. Destdirêjiya li ser van jinan û şêwazên qetilkirina wan, kîna hêzên desthilatdar a li dijî jinê nîşan dide.”

**“Jİ BO CİVAKEKE AZAD EM Ê TÊKOŞÎNÊ BİKİN”**

Zelalê da zanîn ku hevgirtina jinan li dijî kiryarên ku vîna wan hedef digire serkeftina herî mezine û wiha domand: “Hevgirtina jinan li dijî kiryarên qirker serkeftina herî mezin e. Ji bo wê em her dibêjin pêwîst e rêxistina jinan xurt be û hêza wan hebe. Jinan êdî li dijî wê zîhniyeta desthilatdar asteke xwe ya rêxistin û pêşengtiyê ava kirine. Her wiha guhertinên bingehîn bi xwe re aniye. Pêwîst e em jin hîn zêdetir mil bidin hevdu û xwe perwerde, zane bikin.”

**“XWEDÎDERKETİNA Lİ SEDA Û HİNDÊ XWEDÎDERKETİNA Lİ TEVAHÎ JİNAN E”**

Zelalê di dawiyê de têkoşîna jinan a li dijî kiryarên qirker bi bîr xist û wiha bi dawî kir: “Dijminên me dibêjin dema ku em jinan ji holê rabikin, em ê perlgala jinan bin bixin. Lê bila vê rastiyê ji bîr nekin ku her çiqas êrîş giran jî be ewqas têkoşîna me bi hêrstir dibe. Jin di nava felsefeyeke azad de fikrê wê hatiye honandin. Têkoşîna ku em didin meşandin, bi armanca rakirina zîhniyeta DAIŞ’ê û hemû hêzên faşîst e. Xwedîderketina li Seda û Hindê xwedîderketina li tevahî jinan e.”

# Bi vîna jina berxedêr emê tecrîdê bişkînin

**Jiyan BOZO/ Qamişlo**

Ji sala 1999an heta roja me ya îro Tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan her ku diçe girantir dibe. Dewleta tirkî ya dagîrker destûra malbatê û parêzerên wî jî nade ku biçin gel. Ji bo xwedîderketina li Rêber Apo û şkandina tecrîdê, jinên bakur û rojhilatê Sûrî helwesta xwe diyar kirin.

**“EM DEYÎNDARÊ RÊBER APO NE”**

Derbarê mijarê de endama Kongra STAR welatiya taxa Hilêliyê ya Qamişlo Sireya Deham wiha axivî: “ Ev 22 sal in Rêber Apo di girtîgehê de ye. Em tecrîda li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan şermezar dikin. Rêbertiya me netenê ji bo Kurdan ji tevyiya cîhanê kar û xebat kir. Çimkî fikir û felsefya wî gerdonîye. Rêberê me afrînerê jiyana azad e. ji bo dewleta tirkî ya dagîrker bi awayekî hovane êrîş û tecrîda li ser wî pirtir dike. Me bi wî û fesefeya wî xwe nas kir. Jina Kurd ku tine dihat dîtin, bi saya rêbertiyê îro xwedîmaf e. Ji ber wê em deyîndarê Rêber Apo ne” Sireya Deham bi van gotinan qedan: “ Banga min ji her kasê ku qaşo dibêjin em demokratin û ji cîhanê tevî re heye; şerm bikin ma namûs û hesyeta wa nîne. Hûn çawa dibêjin em mirovin û mafê mirovan diparêzin, serokekî ku ji tevayiya cîhanê re kar û xebat dike di girtîgehê de ye. Bi çi mafî serokê me girtiyê. Lê baş bizanin heta dawiyê li dûv riya wî bin û emê azadiya wî ya fîzîkî bi dest bixin.”





**“EV TECRÎD LI DIJÎ ME JINAN E”**

Endama Komîta Şopandina Komînan ya Meclisa Navçeya Qamişlo Şemsîxan Gulo jî wiha axivî: “Di van salên dawiyê de dewleta tirkî ya dagîrker tecrîda li ser rêbertiya me girantir dike. Ji sala 2019an ve ne parêzeran hevdîtin pê re kiriye, ne jî malbatê. Ev tecrî netenê li ser Rêber Apo ye li ser gelên cîhanê tevî ye. Rêber Apo ne serokê Kurdan tenê ye, di roja me ya îro de bi milyonan kes wî nûnerê xwe dibînin û li ser fikir û felsefeya wî têdikoşin. Xwesteka dewleta tirkî ya dagîrker tinekirina rêbertiya me ye. Ev tecrîd li dijî me jinan e. Çimkî rêber Apo projeya azadiya jin bingehê şoreşa xwe girt. Ji ber wê dewleta tirkî ya dagîker tecrîdê li ser rêberiya me girantir dike. Lê bila dewleta tirkî û her kesê xwefiroş bizanin em jin xelaka ji agirin. Bi vîna ku me ji fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan girtiye emê wan têk bibin û rêberê xwe azad bikin.”



## Şahîda Dadgeha Dîrokê Viyan Soran

**Farûk SAKIK**

2 Sibat 2006, gerîllayek kurd bi navê Viyan Soran, li dijî komplogeran, li çiyayê Heftanînê agir berî bedena xwe da û çalakiyek fedayî pêkanî. Di sala 1997’an de dema tevlî nav refên gerîlla bû 17 salî bû. Gerîllayên jin, padigmaya rêber Apo û têkoşîna azadiya Kurdistan naskiribû. Biryar dabû ji bo Kurdistanek azad wek wan gerîllayên jin şer bike. Ji Silêmaniyê birêket û derbasî qadên gerîlla bû.
Di salên têkoşînê de dît ku dîrok li kurdan bêbextiyek çawa kiriye. Di pêvajoya komployê de jî dît ku dewletên Ewropa li dijî kurdan siyasetek çawa qirêj dimeşînin. Biryara çalakiyek dîrokî da. Ji bo vê yekê berî çalakiya xwe di nameyek xwe de waha digot:
“Bi agirê bedena xwe dixwazim peyamekê bidim mejî û dilên qeşagirtî ya şeristaniya civaka çînayetî. Mîna gelek mirovên din jî dixwazim di dadgeha dîrokê de bibim şahidekî ji bo dest nîşan kirina zordarî û derewkariya sîstema dadê û mafê mirovê yê rojava.”
Van dewletên Rojava ku behsa mafê mirovan û hiqûqê dikin çima Vîyan Soran hêrs kiribûn ku dixwest li dadgeha dîrokê bibe şahid?
Van dewletan bi peymana Lozanê welatê wê par û parçekiribûn.
Van dewletan dibin navê Nato de piştgiriyek mezin dabûn dewleta Tirk ku kurdan tune bike.
Van dewletan li hember hemû hovitiyên li Kurdistanê pêkdihatin bêdeng diman.
Van dewletan dibûn sedem ku rêber û hêviya gelê kurd Abdullah Ocalan bi kompleyek navdewletî radestî Tirkiyê were kirin.
Ji bo vê yekê Viyan Soran dixwest li dadgehê ne bi tenê şahidî bike di heman demê de dozvanî jî bike.
Piştî Viyan derbasî dadgeha dîrokê bû, di destpêkê de di derheqê dewletên ku bune sedema dagirkirin û dabeşkirina Kurdistan de doz vekir. Li dadgehê bû dozdar.
Li danişîna 2020’an de Vîyan Soran li dadgeha dîrokê hîsabê dagirkeriya dewleta Tirk a li ser Rojava dipirsî.
Di derheq Rûsya û Amerîka de doz vekiribû. Digot; dema şerê cîhanê sêyem li rojhilata navên û li Sûrî dewam dikir, di sala 2018’an de Dewleta Tirk bi destûra Rûsya kete Efrîna me û di sala 2019’an de jî bi destûra Amerîka Serêkaniyê û Girê Spî dagirkir.
Piştî dagirkeriya van bajêran demografîya heremê hat guhertin û li her deverî hovitiyek mezin pêkhat. Gel ji cihî û warên xwe hatin koçberkirin. Hin kes ji ber ku derfetên wan yên koçkirinê tunebû li Efrînê man. Kesên ku cîh û warê xwe terk nekirin, bi hovitiyek mezin re rûbirû man.
Revandin, tecawiz, talan, îşkence ji bû parçeyek jiyana wan. Mirovahî jî bêdeng ma û tu cararî midaxleyî van kiryaran nekirin. Ji bo vê yekê, Vîyan Soran li dadgehê di derheq mirovahiyê de jî doz vekiri bû. Viyan Soran, edaleta ku li dinya yê nedîtibû, dixwest li dadgeha dîrokê hesab bipirse.
Dîsa dema wê li dadgehê şahidî dikir, dagirker û hin hêzên heremî li kêleka wan, êrişî Heftanînê kirin. Di demek kurt de jî cenga Heftanîn destpêkir. Hevalên Viyan Soran piştî şahadeta wê û li ser mîrasa wê bi demêre xwe nûjen kiribûn.
Li hember teknolojî û îstixbarata pêşketî bi soza dabûn Viyan Soran şerdikirin.
Em nizanin Viyan Soran li dadgehan ew mejî û dilên qeşagirtî ya şeristaniya dewletên rojava heland an na. Lê di sala 2020’an de dema ku Viyan Soran li dadgeha dîrokê şahidî dikir, dîrokê jî li Heftanînê ango li cîhê Viyan ku berbi dagehê birêketi bû, ji lehengiya gerîllayên kurdan re şahidî dikir.

# Cemîl Bayik: Siyaseta hevpar a dewleta tirkî û PDK'ê ji bo gelê Kurd xetereyeke mezin e (1)

Hevserokê KCK'ê Cemîl Bayik diyar kir ku siyaseta dewleta tirkî a dagîrker û PDK'ê ji bo gelê Kurd xetereke mezin çêkir û got "Divê PDK soz bide ku sîxûriya Tirkiyê û xizmeta siyaseta qirkirinê neke."

Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik ji bernameya taybet a Stêrk TV re axivî. Beşa yekemîn a hevpeyvîna Cemîl Bayik wiha ye:

Niha li ser gelê Kurd siyaseta qirkirinê tê meşandin. PKK di bin rêbertiya Rêber Apo de li dijî vê siyasetê sekinî. Gelê Kurd ji bo ji qirkirinê rizgar bike, xwest weke hemû gelên cîhanê li ser welatê xwe bi azadî, nasname û nirxên wan bide jiyîn. Ji bo wê ji bo gelê Kurd tekoşînekî dîrokî pêş xist. Ne hişt ku dewletên dagirker ê faşîst ê qirker, dîsa bi taybet siyaseta qirker a dewleta Tirk bi dawî bike. Bi gelek şêwazan xwest vê siyasetê bimeşînin, lê PKK'ê rê neda vê. Dîtin ku bi siyaseta ku heta niha meşandî nikarin. Ji bo wê Tirkiye guhertinek ji bo xwe esas girtin. Li Tirkiye di rejîmê de guhertin çêkir. Rejîmekî serokkomarê li Tirkiye pêş xist. Ew temamî ji bo bikarin qirkirina Kurd pêş bixin, pêk anîn. Sedema wê ew e. Ji ber ku weke din nikaribûn qirkirinê temam bikin. PKK'ê ev vala derxist. Dîtin ku heta PKK'ê tesfiye nekin, nikarin vê armancê pêk bînin. Ji bo wê jî lazime divê di sîstemê de guhertinê çêbikin. Niha sîstema li Tirkiye Tayyîp Erdogan, Bahçalî, Ergenekon dimeşîne, ji bo wê hate pêşxistin. Armanc ew e. Niha, Tirkiye siyaseta xwe ya hundir a derve bi temamî li ser qirkirina Kurdan pêş dixe. Yekan e armanca wan ew e ku çawa bikarin PKK'ê tesfiye bikin û qirkirina Kurd jî temam bikin. Qirkirina ne tenê li Bakur esas digirin, temamî li hemû başên Kurdistanê ji bo xwe kirine armanc. Dijminê tevahî Kurdan e. Ne tenê dijminê PKK'ê an jî kurdên li gel PKK'ê cih digirin, yan jî Kurdên azadiyê dixwazin. Belkî destpêkê vê dikin hedef, lê hedefê xwe temamî tinekirina Kurdan e. Her ku diçe ev zêdetir tê famkirin. Niha Tirkiye yek jî endamê NATO'yê ye, eleqeya xwe bi Yekîtiya Ewropa re heye, bi van têkiliyên xwe şantaj û tehdîdan jî li her kesê dike. Ji vê hêzê werdigre, bi vê hêzê dixwaze hedefa xwe pêk bîne. Li gel vana yek jî, Şerekî Cîhanê yê Sêyemîn tê meşandin. Dixwazin di vî şerî de encam bigirin, di vî şerî de qirkirinê temam bikin. Wisa hesab dikin, dikarin vê hedefa xwe pêk bnînin. Lê astengiya herî mezin PKK ye. Heta ku PKK'ê tesfiye neke, nikare vê hedefê pêk bîne. Ji bo wê bi hemû hêza xwe dixwaze PKK'ê tesfiye bike. Tê zanîn Komploya Navneteweyî li Şamê destpê kir, vêya Iraq li Başûr dewam dike, dixwaze temam bike. Ji bo wê wexta li Şamê destpê kirin, heta niha di vir de israr dikin. Gelek textîk guhertin ku bikarin komplo bigihînin hedefê. Hatina Hûlûsî Akar, Hakan Fîdan, Fermnadarên Giştî bi şêwazê heyet, hem serdana Iraqê û hem jî li Hewlêrê jî bi rêveberên PDK'ê re civiyan. Bi Mesûd, Nêçîrvan û Mesrûr Barzanî re civiyan. Ev hatin bi temamî ji bo PKK'ê tesfiye bikin e. Ev hêzekî leşkerî û îstixbaretî ye. Ne weke hêzekî aborî û siyasî ye. Eger heyetek ji hêzekî leşkerî û îstixbaretê çêbikî, her kes zane armanca wan operasyonên leşkerî ne. Ji bo wê zarok jî vê fam dike. Ê niha di tesfiyekitina PKK'ê de ti berjewendiyeke zêde ya Iraqê nîne, ji bo wê li ser Iraqê re şantaj û tahdîdan dike. Vê hem Tirkiye û hem jî PDK dimeşîne. Ji ber ku Iraq pirsgirêkên xwe yên giran hene, hinek lewaziyên xwe hene, nikare li dijî vanan bisekine; vana ji vê sûd dibînin. Tehdît û şantajan li ser hev li ser Iraqê çêdikin, ji bo ku bikarin hedefê xwe pêk bînin. Ji bo wê Tirkiye û PDK bi hev re pîlanekê dimeşînin. Dixwazin Iraqê jî tevlî vê bikin ji bo ku berjewendiyên Iraqê zêde têde nîne, bi şantaj û tehdîdan li ser dikin. Ev rewşekî pir cidî ye, divê her kes vê fam bike. Niha, PDK berê bi dizî dijminînahiya PKK'ê dikir, bi dizî li gel Tirkiye li dijî PKK'ê disekin. Lê niha îro vê bi eşkere dike. Bi hatina Hûlûsî Akar êdî her tişt eşkere kir. Tiştekî veşêrin nema.



Çima eşkere dikin? Ji ber ku heta niha bi dizî dikirin, encam nedigirtin. Ji bo wê neçar man ku eşkere dikin. Ji xwe her kesê fam kir, dîtin. Tehşîr bûye. Hem Tirkiye û hem PDK. Di siyaseta li dijî Kurd û PKK'ê dimeşînin de tehşîr bûye.

Ji ber wê bi eşker dijminayiyê dikin. Siyaseta ku PDK dimeşîne bi temamî di xizmeta dewleta Tirkiyeyê de ye. Xizmeta qirkirina Kurdan dike. Tirkiye ji ber ku pêwîstiya xwe bi PDK'ê heye di tesfiyekirina PKK'ê û qirkirina Kurd de, ji bo wê nayê li ser PDK'ê û çavê xwe digre. Ji ber PDK li gel Tirkiyê dijminahiyê bi PKK'ê ji Kurdan re neke, ji ber vê çendê Tirkiye nikare bi xwe hedefa xwe tesfiye û qir bike. Mirov li dîrokê binêre hertim dewletên dagirker hinek Kurd li gel xwe bikar anîne. Çi dema ku derbe li Kurdan da, dibêje yê xiyanet li gelê xwe kirî wê ji bo min jî hîn xiyanetên mezintir bike, pêwîste jiyan neke û hemû jî kuştine. Ger ku mirov dîrokê baş lêkolîn bike mirov wê vê baş bibîne. Ev rewşek pir cidiye. Pêwîste gelê Kurd van baş fam bike. Ev planên ku dewleta Tirk bi piştgiriya PDK'ê dixwaze li dijî PKK'ê li dijî Kurdan bimeşîne, tenê PKK'ê eleqeder nake hemû Kurdan eleqeder dike. Îro PKK rûmet û şerefa Kurd e, yê ku Kurd li cîhanê dayî naskirine, yê ku li cîhanê rêz ji bo Kurd çêkiriye, Kurd kiriye mînak ji bo cîhanê. Niha PKK li tevahî Kurdistanê rûh dide gelê Kurd, hest û rûhê gelê Kurd mezin dike, têkoşîna wê mezin dike, nirxê wî mezin dike. Êrîşkirina PKK'ê êrîşa li dijî gelê Kurd tevahiye. Netenê wisa êrîşa li ser PKK'ê ye, êrîşa li ser Kurdên ku li gel PKK'ê tevger dike ye. Dewleta Tirk dizane ku ger derbeyê li PKK'ê bixe, wê bi hêsantir li yên din bixin. Ji ber ku li dîrokê jî wisa kiriye. Kê berxwedan kiriye, kê derbe kiriye yê ku alîkariya Tirkiyeyê jî kiriye hemû di seatekê de tesfiye kirine. Ev rastiyeke. Ji bo vê pêwîste ku kes ne bêje ev hevdîtinên PDK û Tirkiye tenê li dijî PKK'ê ne, ti eleqeye min li gel nîne, bandorek a wê li ser min çênabe. Dibe ku di kesayeta PKK'ê de ev hevdîtin pêk werin, lê di rastiye xwe de ji bo tesfiyekirina gelê Kurd tevahiye.

Talûkeyek mezin ji bo gelê Kurd çêdike. Pêwîste her kes vê cidî bibîne. Me ne xwest ku ti caran PDK bi dewleta Tirk re wer planan bimeşîne. Wisa xizmeta tesfiyekirina PKK'ê û qirkirina gelê Kurd bike. Lê mixabin tiştên ku çêdibin li ber çava ye. Pêwîste her kesek vê bibîne. Ji bo Kurdan rojev ev e, rojeva yekemîne. Pêwîste Kurd rojeveke din ji bo xwe çênekin, gel rojeveke din ji bo xwe çêbikin xwe dixapînin û dikevin xefletê. Wê çawa li dijî vê siyasetê rawestin û nehîlin ku PDK û Tirkiye pêkve vê siyaseta qirkirinê pêş bixe. Pêwîste li dijî vê rawestin û rê nedin ku kes vê siyasetê bimeşînin, ji ber ku bimeşînin wê ziyanê bidin tevahî gelê Kurd.

## Dewleta Turk li pey xapandina YE ye



Derwêş M. FERHO

Serokkomarê Turkiyê Erdogan berî demekê zirtên xwe li Ewropa dikir. Biryarên rayedarên Ewropî di hember aqil û mêjiyê Îslama Radîkal, siyaseta Turkiyê li Zeryaya Spî, dagirkeriya leşkerê Turk li Rojava, Libya, Suriyê, li Nagorno-Karabax, zora Erdogan diçû. Wî xwest wek her car bi gotinên vala û zirtan civaka xwe bixapîne, serkêşiya cîhana Îslamê xeyal dikir.

Mîna her car gotinên doh digot îro berevajî dike û dîsa difroşe. Îro di ciyê zirtên xwe de, gotinên nerm û zimanekî din dike. Hedef endametiya YE. Lê di heman demê de jî siyaseta xwe bi wan derû û xapan dide domandin. Berî bîst salan bi siyaseta soz û planên reforman ber bi demokrasiyê de û li gor dilê YE hate ser kursî. Lê wî yek soza xwe û planên demokratîzekirinê neanî cî. Berovajî vê, peywendiyên wî bi çeteyên terorîst re heşkere bûn, bû celladê parêzvanên mafên merovan, serkêşê siyaseta zor û zilmê li herêmên Kurdan, xiyanet li prosesa bi Kurdan re kir, welat ber bi Îslama Radîkal bir. Li nav sînorên Turkiyê têr nekir, li dervayê sînor jî dest pê kir û fitne û gelacî xist nava gelek hêz û rêvebiriyên çend dewletan.

Di dema serokwezîriya xwe de wî gelek caran hevdîtin bi sefîrên YE pêk dianî. Berî çendekê sefîr dîsa vexwendin û planên xwe yên nuh xwest rasterê bi wan re parve bike. Got "emê rûpeleke nuh vekin". Heftiya berê jî xwest bi Yewnanistan re peywendiyan deyne. Peywendiyên ku ji 2002 het 2016, bi temamî 60 hevdîtin, pêk hatibûn dîsa dixwaze bidome. Keştiya xwe bi navê Oruç Reis vegerandibû welêt. Lê ne di pirsgirêka Kibris de, ne jî di pirsgirêka herêmên zeryayê di navbera Turkiyê û Yewnanîstan de, rayedarên dewleta Turk bi durustî tev negeriyane. Loma jî ne bes Yewnanîstan, dewletên din yên YE jî paş kiryarên hikûmeta Turk, bi rexneyên dijwar çûn ser Turkiyê.

Wî çi texmîn kiribe nabêje, lê weha xuya dike ku ew bi rûyekî din dixwaze nêzî YE bibe. Loma jî rûyekî nuh û dîsa xapên Osmanî.

Di 21ê Çile de wezîrê karê derve Mevüt Çavuşoglu şand Europa. Bi rayedarên Konseya Ewropa re, mîna Josep Borell, hevdîtin pêk anîn. Ji bo hevdîtinên bi Almanan re pirsgirêk nebûn. Lê tiştê balkêş rayedarên Fransa bi tewra xwe dan zanîn ku deriyê Fransa jî ji bo wezîrê Turk vekiriye. Macron nameyek jî ji Erdogan re şand. Vê yekê hin pirs di serê gelek analîstan de peyda kir. Gelo Macron û hikûmeta Fransa paş wan tehdîd û heqaretên Erdogan çi dixwazin pêk were? Gelo ji xeynî berjewendiyên aborî û navdewletî, pirsgirêka penaberan ji Rojhilata navîn, tirsa YE ji Turkiyê heye? Hebe, ji çi ditirse?

Xuya dike ku dewleta Turk dixwaze bi çerxeke nuh xwe nêzî YE bike. Wê demê Poetin çi dike? Weha xuya ye ku Pirraniya dewletên YE terefdarê domandina têkiliyên bi Turkiyê re ne. Brjewendiyyên aborî, hevkariya leşkerî, bazara çekan, pirsgirêka bi milyonan penaber, … Turk her tim dibêjin "pêdiviya YE bi Turkiyê heye". Lê YE çi zû têkiliyên Erdogan bi Îslama Radîkal re, tehdîd, plan û deruyên wî li ser YE, bazara raketên S-400 ji bîr kir?

Çi dibe bila bibe, tirsa rayedarên YE ne di cî de ye. Ev Turkiye ji YE re ne lazim e. Turkiyê di her alî de darîçav e. Aborî xerab e, demokrasî di bin lingên Îslamo-Turkî de dinale, Trukiyê bi Kurdan re şerr dixwaze. Divê YE kor nebe. Ne dijminê demokrasiyê, pêdiviya têkoşerên prosesa demokratûkbûnê ji YE re heye. Kurd. Garantiya jiyanek nuh di Rojhilata navîn de.


## Rûspiyekî eşîra Şemer: Em amade ne bersiva êrişên li dijî xaka xwe bidin

Ji rûspiyên eşîra Şemer, şêx Ehmed El-Şetî got, ji bo rêgirtina li dijminayî û dagîrkirina herêmên Sûriyê ji aliyê delweta Tirk ve, gelê bakur û rojhilatê Sûriyê amade ne bi her tiştê xwe feda bikin.

Bertekên gel yên li dijî gefên dewleta Tirk a dagîrker yên li ser herêma Dêrikê, pirtir dibin. Ji rûspiyên eşîra Şemer, şêx Ehmed El-Şetî diyar kir ku Erdogan hewl dide dîroka Osmaniyan vegerîne û aloziyên welatê xwe derxîne derve.

Ehmed El-Şetî diyar kir ku tevayiya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê li dijî gefên li ser herêmê destek in û got; gelê herêmê bi hev re Rêveberiya Xweser ava kir û xwîna zarokên wan di rêya parastin û yekitiya xaka herêmê li eniyên şer tevlî hev bû.

El-Şetî nirxandinên xwe wiha domand: "Îdiayên Erdogan ên dagîrkirina herêmên me bê bingeh in. Her kes wê yekê dizane. Ew dixwaze serweriya tevayiya



cîhanê bike, ne tenê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê. Lewra me dît çawa dest li Lîbya, Yemen û Qerebaxê werda. Herwiha dewleta Tirk girîngiya tecrubeya li bakur û rojhilatê Sûriyê dizane, ku ew tecrubeyeke ne ji rêzê yek û dikare çareseriyê ji tevayiya pirsgirêkên Sûriyê re bîne. Ji ber wê yekê bi êrişên xwe vê rêveberiya ku gel tev kir yek, dike hedef."

El-Şetî wiha bidawî kir: "bang li hemû rûspiyên eşîrên ereban û hemû pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê kir ku bibin yek da ku rê li êriş û gefên dewleta Tirk bigirin. Her wiha teqez kir ku hevgirtina hemû pêkhateyan rêya tekane ya bidawîkirina dagîrkeriya Tirk û parastina destkeftiyên gelê Sûriyê ye."



# Li dijî gefên dewleta tirkî banga berxwedanê li êzîdîyan hate kirin

Desteya Oldar û Serokeşîrên Şingalê ji bo ku li dijî êrişên deweta tirkî çrabin, bang li civaka Êzîdî kir da ku nehêlin axa wan ya pîroz bê dagîrkirin û li hember her êrişekê ciwanên Êzîdî dest biavêjin çekan û berevaniyê ji axa Şingalê re bikin.

Li hember gef û êrişên dewleta tirkî yên ser Şengalê, Desteya Oldar û Serokeşîrên Şingalê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de bang li hêz û partiyên siyasî yên êzîdiyan hate kirin da ku li hemberî êrişên dewleta tirkî bibin yek, her wiha bang li tevahiya civaka êzîdî hate kirin ku di dema her êrişekê de dest biavêjin çekan û berevaniya Şengalê bikin.

Di destpêka daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Em wek Desteya Eşîr û Oldarên Êzîdiyan a Şengalê daxuyanî û gefên dewleta tirkî ya dagirker şermezar dikin ku yekemîn welat e bi hemû hêza xwe piştgiriya çeteyan dike û dixwaze serweriya Iraqê binpê bike. Dixwaze xwe bigihîne çiyayê Şingalê ê berxwedêr û herêmê dagir bike, her wiha di çiyayê me yê pîroz bingehên xwe yên leşkerî çêke, bi hincetên xwe yên nerast.

Em dizanin armanca dewleta Osmanî çi ye û ji ber çi destdirêjiyê dike ser welatên



derdora xwe. Dîroka wan a reş a tijî komkujî û qirkirinên li hember kêmneteweyan, wekî Komkujiya Ermeniyan, komkujiyên li dijî civaka êzîdî û elewiyan, bi dirêjahiya dîrokê dixwazin xewn û xeyalên bav û bapîrên xwe bi cih bînin, bi dagirkirina çiyayê Şengalê û pêkanîna komkujiyên nû li dijî civaka êzîdî."

Di dewama daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Em bang li tevahiya gelê xwe yê êzîdî û dostên wan dikin; bi me re bibin yek û em bi hev re Şingalê û pîroziyên xwe biparêzin. Her wiha partiyên siyasî, hêzên leşkerî bi erka xwe ya nîştimanî û olî rabin, bibin yek û li dijî van êrişan bisekinin.

Em ê heya dawiyê şerê xwe bikin çawa me li hemberî çeteyên DAIŞ'ê berxwedan kir û dest ji axa xwe ya pîroz berneda, em ê ji niha û şûnde jî dest ji vê dozê û parastina axa xwe bernedin, berdêlên wê çi dibin bila bibin."

Piştî daxuyaniyê oldarê êzîdî Feqîr Reşo jî axivî û got: "Di dîrokê de gelek aliyên mîna Tirkiyê êrişî Şingalê kirin. Eger Tirkiyr li tunekirina ola êzidiyan digere û bi hincetên cuda dixwaze êrişî Şingalê bike, bila were! Çawa di dîrokê de me serî netewandiye, divê ji niha û şûnde her kesekî êzîdî li dijî van gefan bikeve nava berxwedanê û serî netewîne."

Reşo bang li hikumeta Iraqê kir û got: "Eger hûn ne amade ne serweriya axa xwe biparêzin û rê ji Tirkiyê re vedikin ku êrişî ser me bike, em ê heta dawî li ber xwe bidin."

Yek ji kesayetên êzêdî Hesen Şerîf jî axivî û got divê êzîdiyên li Şengalê li himberî van êrişan bikevin nava berxwednê û êzidî û dostên wan ji derveyî welat jî bikevin nava çalakiyan.

Yek ji serokeşîrên êzîdiyan Şemo Xwedêda jî got: "Şingal hatiye guhartin, ne wekî bere ye ku her kî bixwaze axa me dagîr bike û destdirêjiyê li ser pîroziyên me bike."

Şemo Xwedêda di dawiyê de got: "Eger bi çi hincetê be jî di rastiyê de armanca Tirkiyê tunekirina ola êzîdiyan e û em jî vê qebûl nakin."

## Dîktatoriya xwe qayîm dikin



Mihemed ŞAHÎN

Wisa xuya dike ku hewldanên AKP-MHP'ê yên tinekirina demokrasiyê û qayîmkirina desthilatdariya yek kesî ya totalîter dê di sala 2021'an de jî berdewam bikin.

Weke kû tê zanîn hikumeta AKP-MHP'ê li gel hemû rexne û nerazîbûniyan bi derxistina torbe qanûna bê edalet ya ku bin navê pêwiridarkirina qeyûman de desteserkirin, tasfiyekirin, çewisandin, teslîm girtin û talankirina mal û mikên saziyên sivîl dide wezîrê karên hundir sala 2020'an bi dawî kir.

Çewa torbe qanûna desteserkirina saziyên sivîl di bin navê qanûna "astengkirina fînansa çekên çivak kujiyê" de ji meclîsê derbaskirin û derbeyek din li demokrasiyê xistin niha jî dixwazin di bin navê reforman de li gorî berjewendiyên desthilatdariya xwe torbe bi torbeyan qanûnan derbixin û pergala dîktatoriya xwe qayîmtir bikin.

Di rêza yekemînde reforma (deform) aboriyê heye. Tiştê ku hikumeta AKP-MHP'ê bide gel nema ye û bi qasê serê derziyê di xema gel de nînin. Xema wan a yekemîn parastina sermayedaran e. Di bin navê vê reformê de dê hewl bidin hinek garantiyan bidin sermayedarên xwecihî û yên biyanî ku pereyên xwe bînin Tirkiyeyê. Di heman demî de dê hewl bidin bi qanûnên nû xizmetên perwerdehiyê, tenduristiyê, xizmetên civakî yên saziyên heremîyên ku ji hêla adewletê ve tên dayîn yek bi yek kêm bikin û bidin destê sermayedaran. Sermayedar jî dê wan xizmetan bi pere bide gel. Yanî barê ser milê hemwelatiyan girantir bikin.

Di rêza duyemînde reforma (deform) edaletê heye. Di bin navê refomê de dê hewl bidin dadmendiyê bi awayeke fermî û qanûnî bi tamamî bi Erdogan ve girê bidin û dawî li nîqaş û rexneyên ku car caran tê gotin "ev ne li gorî qanûne" bînin. Dê hemû ferman û mudaxaleyên Erdogan êdî di çarcoveya qanûn de pêk werin. Dê qanûna parastina Dadger û Dozgerên ku mîlîtaniyan wan dikin derbixin û baypaskirina biryarên DMM û Dadgeha Makezagonê ya Bilind meşrû û resen bikin. Gotinên wan ên "biryarên DMM ne ser biryarên dadgehên me re ne" ne tesedufî ne.

Di rêza sêyemînde guhertina qanûnên partiyên siyasî û hilbijartinan hene.

Desthilatdariya AKP-MHP'ê dizane ku di şert û mercên rewa û normalde serkeftina wan û berdewama desthilatdariya wan êdî nepêkan e. Lewre di nava hewldanên dek û dolabên guhertina qanûnan de ne. Niha hewl didin bi guhertina qanûna partiyan û qanûna hilbijartinan serkeftina xwe mîsoger bikin û temenê desthilatdariya xwe dirêj bikin. Ji bo guhertina van qanûnan AKP û MHP di nava bazarê de ne. Kengê bazara di navbera AKP û MHP'ê de bi dawî bû û li ser qanûnên nû li hev kirin dê bînin rojeva civakê û rojeva meclîsê.

Di rêza çaremînde parçekirin, teslîm girtin û bê rûmetkirina odeyên pîşeyan û saziyên muxalîf hene. Weke ku tê zanîn ev hewldan di havîna 2020'an de li ser Baroya Parêzeran hat ceribandin. Li gel hemû nîqaş û rexneyan hikumeta AKP-MHP'ê bi derxistina qanûnên nû rê li parçebûna Baroyan vekirin. Li Stenbol û Enqerê Baroyên duyemîn hatin vekirin. Wekî ku Erdogan her tim tîne ziman niha di dorê de odeya Bijîşkên Tirkiyeyê (TTB) û Odeya Mîmar û Endezyarên Tirkiyeyê (TMMOB) û her wekî din hene.

Bi guhertina van qanûnan dê hewl bidin yek saziyeke muxalîf a ku karibe kiryarên wan rexne bike û li dijî wan daxuyanî bide û li dijî wan siyasetê bike li holê nehêlin. Bi kurtahî dê hewl bidin sala 2021'an bikin sala tesfiyekirin û teslîm girtina civakê û qayîmkirina pergala dîktatoriya xwe.

Piştî ku di van guhertinan de bi ser ketin dê hewl bidin hilbijartineke formalîte ya weke ya Sadam û Esad ku berê de encamên wê diyar in pêk bînin.

Belê, polîtîkayên AKP-MHP'ê yên dijî gel û dijî demokrasiyê diyarin. Mabesta wan jî zelal e. Di vir de ya girîng û ya diyarde dê helwesta muxalefetê be. Dê muxalefet çiaqasî karibe di nava tifaqê de tevbigere û van polîtîkayên wan ên kirêt deşîfre bike û civakên Tirkiyeyê tevilê pêvajoyê bike. Astengkirin encax bi tifaqa partiyên muxalîf û bi tevilbûna civakên Tirkiyeyê ya pêvajoyê dê pêkan be.

Hewceye muxalefet jibîr neke ku ji vê saetê şûn ve ya girîng pêkhatina hilbijartinê nîne, ya girîng dê di kîjan şert û mercan de hilbijartin pêk were.

## Parêzerên Cizîrê xwe wekî parêzerên Ocalan ragihandin

Yekitiya Parêzeran a herêma Cizîrê erkdarkirina hin ji endamên wê weke parêzerên parastina Rêber Abdullah Ocalan, ragihand.

Dewleta tirkî ya dagîrker tecrîdeke giran li ser Rêber Abdullah Ocalan ferz dike û ji 7`ê Tebaxê ve derfet nade parêzer û malbata wî ku serdana wî bikin.

Yekitiya Parêzeran a herêma Cizîrê bi hatina salvegera 22`an a komploya Navnetewyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan ku di 15`ê Sibata 1999`an de pêk hat, daxuyaniyek bi raya giştî re parve kir.

Yekitiyê di daxuyaniya xwe de bang li Mecilsa Mafên Mirovan a desteya NY`yê, Rêxistina Efûyê ya Navnetewî, CPT û dadgeha Ewropa ya mafên mirovan kir ku ji bêdengiya xwe derkevin, dewleta tirkî neçar bikin ku qanûn û lihevkirinên navnetewî yên girêdayî mafên mirovan pêk bîne.



Daxuyanî ji aliyê Hevseroka Yekitiya Parêzeran a Herêma Cizîrê Xedîce Îbrahîm ve li pêşiya avahiya Meclisa Dada Civakî ya bajarê Qamişlo hate xwendin.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku rêber Abdullah Ocalan di 15`ê Sibata 1999`an bi komployeke navnetewî û istixbaratî li pêşiya baylozxaneya Yewnanistanê li Kinya hate girtin û paşê radestî dewleta tirkî hate kirin.

Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Ocalan ji tişta herî biçûk ku parastina jiyana wî ya fizîkî bike, mehrûme. Rastî êşkecekirina fizîkî, piskolojîk û ferzkirina tecrîdê tê. Bi vê yekê dewleta tirkî ya dagîrker mafên mirovan, qanûnên navnetewî bi taybet yên mafên sivîl, siyasî, lihevkirin û qanûnên taybet bi danûstandina bi girtiyên siyasî re, binpê dike.

Em bang li çapemeniya azad, rêxistinên navnetewî, mirovî, mafnas û di serî de Meclisa Mafên Mirovan di Desteya NY`yê, CPT, dadgeha Ewropayê ya mafên mirovan dikin ku ji bêdengiya xwe derkeve û dewleta tirkî neçar bike ku qanûn û lihevkirinên navnetewî yên girêdayî mafên mirovan pêk bîne.

Em hin ji parêzerên xwe ji bo parastina Rêber Abdullah Ocalan erkdar dikin. Em ji bo pêkanîna hemû pêwîstiyan û li pêşiya çi aliyê be, amade ne ji vê kêliyê heta pêkanîna xwesteka me di serbestberdana Rêber Abdullah Ocalan de."

## Îtîlafa Sûrî bikaranîna lîreya Sûriyê ya nû li herêmên dagîrkirî qedexe kir




"Hikumeta Demkî ya Sûriyê" bikaranîna pereyê nû ya Sûriyê ya 2 hezar û 5 hezar lîreyên Sûriyê ku hikumeta Şamê di vê dawiyê der derxistine, qedexe kir.

"Hikumeta Demkî ya Sûriyê" ku ji hêla dewleta tirkî ya dagirker ve hatiye avakirin, bi biryarnameyekê bikaranîna pereyê sûrî yê nû (2 hezar û 5 hezar), li herêmên di bin dagirkeriya dewleta tirkî û çeteyên wê de qedexe kir.

Îtîlafê di demeke berê de, biryara bikaranîna lîreyê Tirkiyê lê şûna yê Sûryê li wan herêman dabû. Ev yek jî girêdana hêrêmên Sûriyê ji dagirkeriyê re bi cih dike.